

Ezmunek dîrokî li pêş me ye

Birasozê Sirûcî

Di vê serdema herî teng ya jiyana tevgera Kurd de, bi qasî girêkên heyî , ewqas gerekî bi çêkirina mala Kurdî heye.

Lewre tevgera Kurd xwe beranberî ezmûnek dîrokî dibîne. Ew ezmûna jî , ji guhartina siyaseta navnetewî ya ku çêdibe û ya dê çêbibe di paşerojê de, xwe encam dide holê. Ewê xuya bike ta kû derê tevgera Kurd kanîbû xwe biçespîne wek tevgera Kurd, di nav hêzên rikber ên niştîmanî sûrî de. Di vê derfetê de , hin pirs xwe didin pêşberî mirov:

Gelo: Ma tevgera niştîmanî ya sûrî(rikber) jê baska Kurd di rewşek wiha de (perçebûn bi perçebûn) , dê kanibe bandorek erênî li rijîma Sûriyê bike?.

Gelo !. Ma wîkîliks, di vê pêvejoya telîz û bi taybetî li Rojhilata Navîn de , dê çi bi xwe re bîne û çi bibe . Bi hezaran belgeh dibin hev de mane.

Ma hibijartina perlemanê Êraqê û çêkirina wezaretan bi şeweyekî demiqras, bi tevî zextên heyî , çi têrorîst û çi bandora rijîmên derdora wê li hêz û berên wê , wek karanînek demiqrasî , dê çi rolê bilîze?.

Gelo!. Gemiya Rojhilata Navîn di paşerojê de, dê bi rêveberiya kê be?. Ger ortaxî be, dê para Kurda hebe.

Bi mijûlbûnek dirêj ji bo bersivdana van pirsan, nemaze ji bo Kurdên Sûriyê. Mirov tenê kane bêje Lêvegergeh ZOR ZOR PÊWÎST E . Mebest ji Lêvegergehê ne ev nava bi xwe e. Lê belê, girîngî ew e ku Tevgera Kurd bi yek deng û helwest be. Û nûnertiya rewa ji miletê me yê Kurd li sûriyê bête wergirtin. Bi pirograma xwe ya rêzanî li kêlek tevgera niştîmanî ya sûrî û li hember dîmena rêzanî ronî bide. Li hember welatê xwe rolek niştîmanî bilîze , da ku kanibe çareseriyek dadmend ji doza xwe ya Kurd re bike, û doza demoqrasiyê li

welatê xwe bibe serî.

Careke din, pirojeyeke weke Lêvegergeh bi pêdiviyê guftûgo, danûstandin û guhdarkirinê li ser raman, bîr û baweriyê ye. Da ku bi hev re teşeya programek rêzanî bipelgehînin . Amediya xwe ji vê heyama rêzanî ya guhartî re saz bikin . Ne ku bi ser hev de bidin girî û bêjin: 'Wax dê çawa bibe'. Helbet piştî bûyera rêzanî cihê xwe bigre, wê hîngê tevgera Kurd dê bibe bireserê pesnên Mala Çîçekê. Emê bi kurtî çîroka mala çîçekê bînin zimên: Yekî kurekî xwe yî bi tenê hebû. Bi qasî bi delalî xwedî kiribû, ew zû jî bi jin kir. Bûka jê re xwestî wek wî bi delalî xwedî bibû. Piştî çend rojan xezûr bi bûka xwe şadibe û dibêje: Salê tê, tuyê bibî diya zarokekî û navê wî ezê lêkim Delal. Bi qasî çûkiya xwe fedîkir û ber ve bîrê çû. Dît ku devê bîrê vekiriye û mêweya çîçekekê nû dibişkife di qeraxa wê de hêşin hatiye. Seriyê xwe da ser çongên xwe û giriya...

Ji xezûr be ku ji ber gotina wî giriya (wek lax), got: Tu çima digriye keça min ?. Xezûr, xwesî û mêr di ser re rawestîn. Bûkê bi kelgirî got : Hûn vê mêweyê dibînin?. Ta sala tê wê mezin bibe û çîçekan bigre. Û Delalê min ku were çîçekan jêke , dê têkeve bîrê û bimire. A xezûr , xwesî û mêr jî didin girî bi ser de û kî ji malbata wan tê bê pirsîn , ew jî bi ser de dide girî... Wanî nav lê bûn MALA ÇÎÇEKÊ. Ta ku wek mala çîçekê li me nebe, berî her gaveke din divê kort û çehlên dor xwe kor bikin û bi erkên xwe yên netewî û niştîmanî rabin.

Herwiha her mirovekî Kurd dimîne tewanbarê tevleşbûna hêviyên miletê me yê Kurd û beravêtina armancên wî yên ji bo hilanîna mafên me yên netewî yên rewa, ta ku bête rawestî li hember dadwer (nifşên nû) di dadgehê de. Ev dadgeha gelêrî di biryara xwe de ya herî sert û dijwar e. **D. R. (11)**